

Serhildana Zanyariyên Serkutkirî: Bîra "Fermana Filehan" li Diyarbekirê

Adnan Çelik*

Kurte

Diyarbakir ew cih e ku bêdengî û tabûya li ser jenosîda ermeniyên li berê pêşî lê tê şikandin. Herwiha hem hingê di pêvajoya jenosîdê de û hem di peydabûna "bîreke giştî" de li ser meseleyê li van heyamên dawî cihêkî sembolîk û navendî ye. Ev gotar hewl dide bi rêya tehlîla daneyên ji du lêkolînên meydanî hatine berhevkirin nîşan bide ka çawa qewimînên tarîxî yên 1915an di şîûra şênîyên kurd de zebtkirî ye û ka çawa bîreke hevbeş li dor van qewimînan di asta Diyarbekirê de durist bûye, ku dimîne "bîreke dijber" ya li dijî tarîxnivîsiya resmî ya dewletê. Gotar herwiha naveroka wê "bîra dijber" ya li cem mirovên asayî tehlîl dike, ku awayekî "serhildana zanyariyên serkutkirî" di çarçoveya jenosîda ermeniyên de li meydana kurdî çalak dike û tevahiya nivîsevaniya tarîxî ya resmî ya dewleta tirk a derheqê 1915an de red dike.

Termên serekî: Jenosîda ermeniyên, Diyarbakir, kurd, bîra dijber, zanyariyên serkutkirî

Abstract

Insurrection of subjugated knowledge: The memory of "Armenian Firman" in Diyarbakir
Diyarbakir is where the breaking of the silence on the Armenian genocide starts. It occupies a symbolic and central place both with respect to the very process of the genocide and nowadays with regard to the emergence of a "public memory" on the issue. Based on extensive data gathered during two field studies in Diyarbakir, this article tries to depict how the 1915 events are recorded in the memory of the Kurdish inhabitants and how a shared memory around those events have taken shape in Diyarbakir, which, as a "counter memory" stands against the official historiography of the state. The article also elaborates on the content of that "counter-memory" and the "subjugated knowledge" held by ordinary Kurdish subjects regarding the Armenian genocide, which generate an "insurrectional content" with respect to the official narrative of the Turkish state regarding the 1915 events.

* Xwendekarê doktoraya Antropolojiyê,
Zanîngeha EHESS, Paris,
e-mail: adnan.celik@ehess.fr

Destpêk*

*Bikaranîna biqîmet a birînên bîrê ji
xebata li ser karê bîrê dest pê dike.¹*

Diyarbakira bi piranî kurdnişîn wek paytextê filî yê Kurdistanê bakur e û herwiha ew cih e yê ku bédengî û tabûya li ser jenosîda ermeniyên li berê pêşî lê tê şikandin. Tevgera kurdî bere bere berpirsiyariya xelkê kurd di jenosîda ermeniyên de vedinase. Di demekê ku hêj jî bédengiyêke mezin li ser jenosîdê heye, li herêma kurdan, bi taybetî li Diyarbakirê, hejmara xebatên ku berê xwe didin têngihiştina cîhetên cuda yên vê meseleyê di van çend salên dawî de zêde bûye. Bi xêra van xebatan êdî bêtir zanîna me li ser tarîxa vê herêmê,² li ser pêvajoya jenosîdê,³ li ser destdanîna ser mal û milkên ermeniyên,⁴ li ser rabirdû û serhatiyên xelasbûyîyên jenosîdê,⁵ li ser ermeniyên misilmankirî⁶ û tarîxa devkî (zarekî) ya jenosîdê⁷ heye. Ji van xebatan jî xuya dibe ku hem di pêvajoya jenosîdê de û hem jî di peydabûna bîra “giştî” ya li ser meseleyê de, Diyarbakir di van heyamên dawî de bûye cihekî simbolîk û navendî.

Ev gotar xwe dispêre du lêkolînên meydanî yên li Diyarbakirê. Ya yekem di salên 2013 û 2014an de di çarçoveya projeya “1915, kurd û Diyarbakir” de bi piştgiriya Weqfa İsmail Beşikci hat encamdan. Armanca serekî têngihiştina seh û bîra kurdan ya derheqê jenosîda ermeniyên ya 1915an de bû. Rêbaza lêkolînê ya bingehî berhevkirina tarîxa devkî bû; û wek asîstanê lêkolînê min bi xwe gelek hevpeyvîn çêkirin. Encamên vê lêkolîna meydanî di kitêbekê⁸ de, ku min û hevkarêkî tarîxnas bi hev re nivîsî, hatine belavkirin. Lêkolîna meydanî ya din jî ew e ya ku ji sala 2013an û vir ve ez ji bo xebata xwe ya doktorayê dikim. Ev xebat li ser sê navçeyan e: Pasûr, Licê û Farqîn yên wîlayeta Diyarbakirê. Rapirsîya min berê xwe dide zor û şideta dewletê ya li Kurdistanê bakur û cîhetên civakî-mirovî (*sosyo-antropolojîk*) yên dubendî û nakokiyên di nava kurdan yên di çarçoveya mehellî de. Ev xebat dikeve pey destnîşankirina derzên ji heyama şerê di navbera PKK û artêşa tirk ya salên 1990î de yên di nava kurdan de û dixwaze tê bigihe ka ew xetên derz û dubendîyan ji ber hejmareke fakteran, wek dînamîkên mehellî, mensûbiyeta eşîrî, dabeşbûnên navxweyî di hindêk malbatan de, tesîra sosyalîzasyon û siyasîbûnê, çawa peyda dibin û fireh dibin. Gava ez li gel şênîyên wan deveran derheqê hizir û hestên wan ên li ser şerê salên 1990î de diaxivîm, pir bi zelalî diyar bû ku ji bo wan 1915 qet tarîxeke qedîm nebû, belkî pir nêzik

* Gelek spas ji bo Ergin Öpengin, Musa Çelik Eki-cî û Dawid Yeşilmen ku di amadekirina kurdiya gotarê de alîkariya min kirin. Herwiha spas ji bo du hekemên ku bi pêşniyarên xwe hin aliyên girîng ên meseleyan anîn ber bala min.

bû. Li pişt hikayetên heyamên dawî/nêzîk, di cî de hikayeteke dî, bîreke dî, ya girêdayî jenosîda ermeniyên ya 1915an dadinizilî.⁹

Ez dixwazim di vê gotarê de bi rêya tehlîla daneyên ku di çarçoveya van lêkolînan de li meydanê hatine berhevkerin nîşan bidim ku bîra zindî ya gel di derheqê jenosîda ermeniyên de li dijî tarîxnivîsiya resmî ya dewleta tirk e. Her çend tarîxa resmî bîreweriyên mehrem paş ve bide jî, nikare wan ji nav bibe.

Awirvedaneke kurt li ser paşxaneya tarîxî

Di destpêka sedsala 19an de, wîlayeta Diyarbekirê ji gelên cuda, wek kurd, yaqûbî, nestûrî, kildanî û ermenî, pêk dihat. Li dû serjimêriya patriyarkê Konstantînopolê ya sala 1914an, li du sed û çil û neh mehelên wê 106.867 ermenî dijîyan. Li bajarê Diyarbekirê, anku li paytextê wîlayetê, hejmara ermeniyên nêzîkî sê ji yekê sercemê nufûsê, anku li dor 45.000 kesan, bû. Ji nufûsa wan a qerebalix girîngtir, giraniya wan a di warê aboriyê de bû, lewre hema bêje tevahiya sinaet û ticaretê di destê wan de bû.¹⁰

Di dema şerê cihanî yê yekem de, pêvajoya jenosîda ermeniyên li Diyarbekirê bi fermanên walî doktor Reşid (ku yek ji danerên Cemiyeta Îttihad û Terakkîyê (CÎT) bû li Diyarbekirê) û bi hevkarîya dezgehên dewletî, malmezî, milîs, eşîrên kurd û rîspiyên dînî ve bi rê ve çû.¹¹ Sibeha 21ê nîsana 1915an, berpirsiyarên serekî yê partiyên siyasî yê ermenî hatin girtin. Qederê bîst rojan paştir, 11ê gulana 1915an, girtina hejmareka mezî ya serkêşên mehelli yê ermenî jî dest pê kir.¹² Paşê, tevahiya ermeniyên navenda Diyarbekirê hatin tehcîrkirin û qetlkirin. Di dawiyê de tehcîrkirin û qetlkirina ermeniyên li hemû deverên wîlayetê belav bû.

Wek gelek tarîxzan û lêkolanan cext lê kiriye,¹³ rola walî Reşidî di tehcîr û qetla ermeniyên de li Diyarbekirê, pir mezî bû. Walî Reşid berî ku wek waliyê Diyarbekirê teyîn bibe di 3yê adara 1915an de telegramekê ji Talat Paşa wezîrê navxwe re dişîne û dibêje: *"Min dil lê ye usûla herî yekser û kurtebir li dijî ermeniyên tehbîq bikim."*¹⁴ Teyînkirina doktor Reşid wek waliyê Diyarbekirê 25ê adara 1915an li gel biryarên ku komîteya navendî ya CÎTê ya hêj nû di derheqê ermeniyên de girtibûn¹⁵ pir hevaheng e. Jixwe walî Reşid di telgrafeke din de ku wî 28ê îlona 1915an ji wezaretê navxwe re şandibû diyar kiribû ku 120.000 ermenî bi fermana wî ji Diyarbekirê hatibûn tehcîrkirin.¹⁶ Wek ku em ê di rûpelên jêr de bibînin, peyva "tehcîr" ya ku walî Reşid bi kar anîbû bi armanca "veşartina maneya bûyeran" bû. Xelk zêdetir peyva "eşkerekirin"ê ji bo van bûyeran bi kar tîne. Gelek xebatên dîrokî –ku em ê behsa wan li jêr bi berfirehî bikin– jî diyar dikin ku ya ku ew bi "tehcîr" nav dike heman "qetlîam" e û ne tiştêkî din e. Wek nimûne, Kévorkian¹⁷ diyar dike ku li Diyarbekirê piraniya

ermeniyên tehcîrkirî hêj gelek berî ku bigihin devera resmî ya tehcîrê, hatibûn qetilkirin. Li gor zanyariyên di derheqê sed hezaran ermeniyên ku ji cih û warên xwe hatibûn şandin bo çolên Sûriyeyê, ji Diyarbekirê tenê heşt jin li Reqqayê, zarokekî dozdehsalî li Helebê û çend jin û keçik li Dêrezorê hatibûn tesbîtandin. Ne tenê ermeniyên ji Diyarbekirê, lê herwiha yên di wan qefleyan de yên ku ji herêmên din hatibûn jî ketibûn ber qetlîamê, lewre wîlayeta Diyarbekirê li ser rêya karwanên ber bi Sûriyeyê ve bû. Bi vî rengî, walî doktor Reşidî hema hemû ermeniyên vê herêmê bi “*usûla herî yekser*” ji nav birin.

“Serhildana zanyariyên serkutkirî” li dor jenosîda ermeniyên di meydana kurdî de

Berî ku em bikevin nav temayên girîng ên bîra 1915an li Diyarbekirê, bicî ye em li çarçoveyeke teorîk an jî hizrî ya Michel Foucault binêrin ku dihêle hin hêmanên *vegêrnanan* yên ku me berhev kirine wek berhemên “serhildana zanyariyên serkutkirî” bînin dîtin. Di derseke xwe ya 1976an li Collège de Franceê Foucault diyar dike ku mebesta wî bi têgeha “zanyariya serkutkirî”du tişt in:

Li milekî, mebesta min tevahiya wan zanyariyên tarîxî ye ku bi hevahengiyên kêrhatî û bi sîstematîzekirinên formel hatine çalkirin an jî veşartin. Lewma, “zanyariyên serkutkirî” koma zanyariyên tarîxî ye ya ku di nav tevekiyên (*ensemble*) kêrhatî/ fonksiyonel û sîstematîk de mewcûd lê veşartî ne, û ku bi rêya pêdeçûnên hûr rexne dikare ji nû ve bide xuyakirin.¹⁸

Öztañ û Turan vê pênaseya pêşîn ya Foucault wek bingeheke serekî di înkara jenosîda ermeniyên ya di gotara resmî ya dewleta tirk de dizanin.¹⁹ Tarîxnivîsîna fermî vê “sîstematîzekirina formel”, ya ku piraniyeke mezin a welatîyên tirk pê re ne û ku dihêle hindêk zanyariyên tarîxî di mexzenên tarîxa resmî de²⁰ bêne bincilkirin, dinimîne. Rêkxistin, belavkirin û kontrola tarîxnivîsiyê ji lûtkeyên dewletê wisa dike ku zanyariya tarîxî li Tirkiyeyê bi temamî bibe “zanyariyeke serkutkirî”, ku welatî gelek caran bi tenê wergirên wê yên pasîv in.

Maneya duyem ku Foucault li vê têgehê dike bi taybetî ji bo me girîng e:

(...) Bi “zanyariyên serkutkirî”, mebesta min herwiha komeke zanyariyan e ku ji rewacê tînin xistin ku belê agahiyên ne-têgehî ne, agahiyên bi tîra xwe ne-ravekirî ne. Anku agahiyên naîv in, agahiyên di hiyerarşiyê de nizm in, agahiyên li jêr standardên zanyarî û zanistîbûna pêwîst in (...).²¹

Ji bo Foucault têgeha "zanyariya serkutkirî" agahiyeke ji rewacê ketî ye, li çav hiyerarşiya zanyariyan bê girîngî ye û carinan jî mehkûmî "qerax û perawêzê" tê kirin. Mirov dikare bêje ku bi wateyekê²² zanyariyeke bêqedr û bednam e her wekî li Tirkiyeyê jî di nimûneya zanyariya derheqa jenosîda ermeniyen de tê ber çavan. Ev meseleyek e ku hêj jî wek cihê şermê, wek kun û valahiyeke di tarîxnivîsî û zanistên civakî yên li Tirkiyeyê de ye.²³

Rola tarîxnivîsiya resmî di avakirina huwiyeta netewe-dewletî de baş tê zanîn. Heta niha gelek nivîskaran, yên ku li ser Tirkiyeyê nivîsiye, cext li ser tebîeta vederker a "eqda neteweyî" li ser bingehê qewmîyeta tirk kiriye, ku wê eqdê rêberiya avakirina komara tirk kiriye²⁴; lê belê, Barış Ünlü yekem kes e ku bi rêya têgeha nû ya *Türklük Sözleşmesi*, anku "eqda tirkîtiyê", ronkatiyeke taze dixê ser vê diyardeyê. Nivîskarê navhatî dêna xwe dide ser cîhetê neyekser yê pêvajoya vederkirin/vehewandin ya komên cihê bo nav "netewe"yê, û hilgirtina tevekîyeke (*ensemble*) zanyarî û hestên hevaheng li gel eqda bingehî li bal tebayên neteweya tirk. Ew eqd bi awayekî "bingehê maddî û îdeolojîk" yê komara Tirkiyeyê dadine.²⁵

Tabî'îya "eqda tirkîtiyê" yekser beramberî pênaseya yekem a "zanyariyên serkutkirî" ya Foucault ye. Bi ya Ünlü,²⁶ berî şerê cîhanî yê yekem, "eqda îslamê" ew wezîfeya bingehê hiyerarşiya tîkiliyên di navbera komên di nav Împeratoriya Osmanî de didît. Kurd jî wek cemaeteke musulman di nav wê eqdê de bûn û ji aliyê qanûnî û rewacê ve nisbet bi xeyrî-muslîman mewqîfekî wan ê rasertir hebû. Ev eqda îslamê di heyama "şerê rizgariyê" de yê bi serkêşiya kemalîstan hêj jî li kar bû û karîbû komên mezin ên kurdan, bi pîranî yên sunnî, têxin nav refên xwe. Lê belê, hêj deh sal di ser jenosîda ermeniyen re nebuhurî bûn û yekser piştî avakirina komarê, "eqda neteweyî" nema li ser mensûbiyeta muştêrek a îslamê lê li ser mensûbiyeta qewmî ya tirkîtiyê hat sabitkirin. Sala 1925an, gava serhildana Şêx Seîd li dijî rejîma nû ya komarê rû dide, kurdan di fîliyatê de xwe li derveyî wê "eqda tirkîtiyê" didît.

Li aliyekî, musulmanên ji qewmîyetên cihê yên ku ev eqd qebûl kiribû diviyabû hemû gotarên avaker yên tirkîtiyê hilgirin, û ji bo vê yekê diviyabû bîr û zanyariyên xwe yên di derheqê rabirdûyê li jêr nîzameke nû ya "zanyariyên serkutkirî", ku înkara jenosîda ermeniyen stûneke wê bû, bi cih bikin. Li aliyê din, kurdên ji vê pênaseya neteweyî ya nû vederkirî, ya ku bi eqda tirkîtiyê raçandî bû, berê xwe dida ragirtina mesafeya li gel gotara resmî û ev yek bû haveynê derhatina "bîreke dijber" (*contre-memoire*).

Niha em lê binêrin ka têgeha "zanyariya serkutkirî", bi maneya xwe ya duyem ya ji Foucault, çawa ronkatiyê dixê ser pîrsa me ya lêkolînê ya li dor "bîra dijber". Lauren Berlan diyar dike ku bîra dijber "di qeraxên coxrafî yên koloniyê de, di deverên sîberî yên hişê takekesî de şikl digire, û bi dizî ve rexneyê li

tarîxa resmî digire an jî hêman û şêwazên meşrû yên wê tarîxê dileqîne.”²⁷ Ev diyardeya xistina jêr pirsyaran ya tarîxnivîsîna resmî li cem kurdan heye. Di vê xebatê de min divêt nîşan bidim ka çawa qewimînên tarîxî yên 1915an di şûra agahîderên min de zebtkirî ye û ka çawa bîreke hevbeş li dor van qewimînan di asta Diyarbekirê de durist bûye. Herwiha, min divê naveroka çend parçeyên vê “bîra dijber”, yên van “zanyariyên serkutkirî” yên mirovên asayî (bi maneya duyem a Foucault) tehlîl bikim ku bi awayekî “serhildana zanyariyên serkutkirî” di çarçoveya jenosîda ermeniyana de li meydana kurdî çalak dikin, û tevahiya nivîsevaniya tarîxî ya resmî ya dewleta tirk di derheqê 1915ê de red dike.

Çend parçe ji dîmenên bîrewer yên 1915ê li Diyarbekirê

Wekî me li jor jî gotibû hemû tarîxnivîsîna tirk ya ku di xizmeta hebûna dewletê de hatiye duristkirin li ser înkara jenosîda ermeniyana ava bûye.²⁸ Li dû vê tarîxnivîsînê, ermeniyana di heyama şerî de “xiyanet” li Împeratoriya Osmanî kiriye û ew in yên ku bi hevkarîya rûsan qetlîam li tirkan kiriye.²⁹ Li aliyê kurdan, şûn û şopên tarîxa 1915ê di wan “zanyariyên serkutkirî” de tînin ku neslên berê devkî veguhastine neslên nû û ku dijî versiyona tirkperest û dewletnavendî ye.

Di gotareke heyama dawî de,³⁰ me nîşan da ka, tevî rabihurîna sedsalekê bi ser qewimînan re, ev bîra jenosîda ermeniyana li cem kurdan heta çî astê zindî ye. Mirov dikare ji bo zindîmana vê bîra dijber ya ku devkî hatiye veguhastin şeş sebebana destnîşan bike: (1) hebûna rabirdûyeke hevbeş ya kurd û ermeniyana ku tê de saziya civakî ya *kirîvatî*³¹ keresteyê pêkvejiyanê bûye; (2) tebîeta hovane ya şîdeta jenosîdê; (3) hebûna mekanên tevkuştinê li ser erdê ku her dem vê felaketê bi bîra nişteciyana tînin; (4) zimanê kurdî wek devereke bîra dijber ku nakeve nav çeperê gotara resmî ya tirk; (5) hikayetên gelek ji ermeniyên xelasbûyî, gelek caran musulmankirî; (6) axirî, rola tarîxnivîsiyeke nû ku tevgera kurdî dide ber xwe ku ev tarîxnivîsî qîmeteke taybetî dibexşe ser tarîxa devkî û wê hêz daye derhatin û berbelavbûna hikayetên derheq jenosîda ermeniyana.

Gelo piştî sedsalekê em dikarin ji bîranînan ku li ser 1915ê hatine berhevkirin çî hîn bibin? Temayên hevbeş di wan hikayetan de çî ne? Gelo ew hikayet derheqê rewşa heyî ya avakirin û veguhastina bîreke dijber a jenosîdê ya taybetî bi kurdan ve çî nîşanî me didin? Ji nav gelek cîhetên ku ji hikayetên agahîderan xuya dibin, me ji bo vê xebatê sê temayên girîng neqandin ku avahiya bîra resmî serûbin dikin.

Binavkirina 1915ê di bîra kurdan de

Walter Benjamin dibêje ku cewherê tiştan ne *bi rêya* navan, lê *di nav* navan de tê raguhastin: "Xala bingehî ew e em tê bigihin ku ev cewherê razber/giyanî di zarî de ne bi wî tê raguhastin."³² James Young jî diyar dike ku kiryara binavkirina (*dénomination*) çarçoveyên zanyariya qewimînan mane û şîroveyên taybetî li ser şiklê têgihîştina wan durist dike.³³ Alice Krieg binavkirinê wek girêdanekê (*engagement*) pênase dike ku ji bo hilgirtina helwêst û mewqîfekî siyasî, ji bo derbirîna fikrekê, danqebûlkirina kiryarekê, an jî parastina prensîbên exlaqî kafî ye.³⁴ Ev nivîskar cextê lê dîkin ku kiryara binavkirinê, ya wesfkirinê, ya pêvekirina kelîmeyan bi ser tiştan ve di avakirina civakî ya heqîqetê de xwedanê roleke bingehî ye. Girîngiya serekî ya kelîmeyan, li gel barê wan ê remzî û îmayên wan, li me ferz dike ku baş dêna xwe bidin peyvdan û bikaranîna peyvvan ya agahîderan, ku ev yek di heman demê de girîngiya birêvebirina lêkolînê bi zimanê dayikê yê agahîderan piştrast dike. Heke piştî vê girîzgehê em li binavkirina qira ermeniyên di nav kurdan de binêrin, em dibînin ku li cem kurdan çendî nav an derbirîn derheqê jenosîda ermeniyên de hene. Weku em dê li xwarê bibînin, nav û binavkirinê 1915ê yên di nav kurdan de hindê xalan yên li ser sehên kurdan yên di derheqê jenosîdê de lê herwiha li ser ast û zêdeyiya şidetê û fail û rêbazên qetlîfîmê di hengava jenosîdê de li me ron dîkin.

Gava xelk derheqê 1915ê de diaxivin, bi van peyv û derbirînan qewimînan bi nav dîkin: *Ferman, fermana filehan, qirkirina filehan, qetlîkirina filehan, qelandina filehan, firxûna ermeniyên, terteleyê ermeniyên, dema birrînê, dema qefle û terqa filehan*.³⁵ Maneya serekî ya van nav û peyvvan nîşanî me dide ku kurd wê heyamê wek heyama zulm û şideteke pir mezin bi bîr tînin.³⁶

Peyva herî berbelav di nav agahîderan de *ferman* an jî *fermana filehan* bû. "Ferman" emr û qanûnek e ku sultanê dewleta Osmanî der dike. Ew peyv di bîra cemawerî ya kurdan de, bi taybetî di kilaman de, nîşaneyê tirs, şidet, zulm, mirin û zexta dewleta Osmanî ye. Di nimûneya jenosîda ermeniyên de, bikaranîna vê peyvê rola plankirina navendî ya berpîrsên dewletê tîne ber çavan. Piraniya agahîderan bi vê hevokê dest bi hikayeta xwe ya jenosîdê dîkir: "Dema *fermana filehan* dest pê kir". Îfadeyên wek "qirkirina filehan", "qetlîkirina filehan" û "qelandina filehan" tebîetê şedîd, hovane û xwînî yê jenosîdê tînin bîra mirov. Îfadeya "firxûnê ermeniyên" ya ji zardevê agahîderên zazakî-ziman gelek serincrakêş e. Ji ber ku ev gotin jenosîdê wek pêvajoyeke bi îradeya qelandina *hemû* endamên qewmekî tîne hizra mirov. Feritê ku sala 1962yan li Pasûrê ji dayik bûye wiha peyva "firxûn"ê, ku bi tenê di nêçîra kewan de tê bikaranîn, bi mane dike:

Ma zimistanî şînê seydê zerecan. Qeybê komê zerecan ma vanê 'ref'. Gama ma seyd de heme refê zerecan bikşin, ma vanê 'min qirê zerecan ard'. Yanê 'min heme zerecî kiştî'. Qeybê meseleya

armeniyana ke ma vanê ‘firxûnê armeniyana’, çimkî heme amayê kişîşî, qirê cîne amew. (*Ferit, parçeyek ji hevpeyvînê, çiriya pêşî 2013*).

Gotina “dema qefle” tehcîr û derkirina armeniyana tîne hizra me. Me ev gotin zêdetir ji zardevê wan agahîderan yên ku li gundên li ser rêya tehcîrê ber bi çolên Sûriyeyê (wek Licê, Pasûr, Farqîn, Gêl, Bismil û Şankûş) dijîn bihîst. Bi taybetî di hikayetên armeniyên musulmankirî de ev gotin gelek dihat.

Gotina “dema birrînê” şikl û amrazên qetlîamê derdibirre. Faruk yê ku di sala 1962yan de li Pasûrê ji dayik bûye guh li çendîn hikayetên jenosîdê ji meta xwe bûye û wiha behsa vê gotinê ji me re dike:

Emr hatibû ku armeniyana bibirrin. Emr dabûn ku wan bibirin. Wê hingê sîleh pir tunebûn. Lewma ew bi şûr û dasan kuştin, yanî ew sîlehên ku wê hingê hebûn (*Faruk, parçeyek ji hevpeyvînê, çiriya paşî 2013*).

Ji van nimûneyan xuya dibe ku binavkirinên 1915ê di bin tesîra tecrubeyên kurdan de derhatine, di gotinên beloq de sabit bûne, ku ev gotin, bi rengekî, rehendên bireke cemawerî ne ku tarîxeke ji neheqî û şidetê û yeka nayê jêbirin nîşan didin. Herwiha, di van navan de, hîlbijartina peyvan xeyaleke gelek teswîrî ya heqîqeta qetlîaman radiguhêze. Mana wan a heta roja îro di zimanê rojane de baş dide xuyakirin ku li bal van agahîderan û kesên wek wan gelek ron û aşkera ye ku qewimînên 1915ê qetlîameke qestî/zanistî bû û armanca wê jinavbirina armeniyana bû, ku heman tesbît di parçeyên din ên hikayetên wan de tê piştrastkirin.

Rola akterên mehelî di jenosîda armeniyana de

Tarîxzan Jacques Semelin diyar dike ku qetlîam qewimînên aloz û pir-alî ne ku tê de bi qasî akterên navendî, yên mehelî jî xwedanrol in, û her yek ji van kome akteran wêrankariya xwe li gor daxilbûn û/an jî mudaxilbûna terefên nêzîk û dûr diguherin.³⁷ Ev dîtin me han dide bibînin ku aliyên qetlîamê yên “ji jor ve” û yên “ji jêr ve” hene, û baş jê haydar bin ku divê tehlîla me di konteksta tarîxî ya qewimînan de bê bicîkirin. Ji ber ku, her çend di pêvajoya wêrankirinê de handan (biryar û rêkxistina qetlîaman) ji jor ve be jî, gelek girîng e em tê bigihin ka ev handana navendî çawa bi destê akterên mehelî hatiye tetbîqkirin û hilgirtin.³⁸ Di nimûneya armeniyana de, derheqê “beşdariya civakî” de, Bozarslan cextê lê dike ku:

Her wekî di nimûneyên din ên jenosîdê de, di pêvajoya wêrankirin û qetlîamê de ne tenê berpîrs û akterên dewletê hene. Ya rast, hemû belgeyên heyî nîşan didin ku di çî rewşekê de ev "akterên din" bi rengêkî serbixwe hereket nekirine. Gelê asayî bi rengêkî yekser û jixweve beşdarî di qetlîaman de dike tenê ji ber ku ev "jixweveyî" bi îcazet e, anku bi awayekî aşkera dewletê ruxseta wê yekê daye, û, ji bilî haletên talanê, baş hay ji hidûdên wê ruxsetê jî heye.³⁹

Axirî, potansiyela wêrankariya li dijî ermeniyên, ku hêj berî şerê cihanî yê yekem mewcûd bû, bi qewimînên 1915ê di tifaqeke di navbera dewlet û akterên din ên wek çeteyên rêkxistî, malmezînan cihî, serkêşên dîndar û eşîretên kurd de şikl girt.⁴⁰ Bi ya Norman M. Naimark, beşdarî û berpîrsyarî di tawanên 1915ê yên li dijî ermeniyên de divê di sê astan de bîn dîtin: (1) di asta herî bilind de, biryargirên qetlîaman; (2) di asta navîn de, berpîrsyarên mehelî, yekîneyên polîs û eskerî ku emrên ji rêveberiya CÎTê şîrove û tetbîq kirine; (3) di asta nizm de, mirovên "asayî" yên ku di qetlîam û talanên li hengava jenosîdê de cih girtine.⁴¹

Bi tetbîqa modêla Naimark li ser nimûneya jenosîda ermeniyên li Diyarbekirê, mirov dikare wiha li rewşa li wê derê binêre. Di asta herî bilind de biryargirên qetlîama li dijî ermeniyên Cemiyeta Îttîhad û Teraqiyê ye ku li Diyarbekirê bi walî Reşid dihat temsîlkirin. Navhatî di heman demê de hem walî bû û hem serekê cihî yê Rêxistina taybetî (Teşkilat-ı Mahsûsa), teşkilata nihênî û baskê çekdar yê CÎTê⁴² bû.⁴³ Di asta navîn de, çar refên mezin ên akterên cihî roleke navendî di rêkxistin û tehcîra ermeniyên û di pîjkirina niştecihan li dijî wan gêra: mezinên Diyarbekirê (eşraf), axa, beg û şêxên deverê.⁴⁴ Di her yek ji van refan de, akteran cihê xwe yê xas di rêkxistin û birêveçûna jenosîdê de li Diyarbekirê hebûye. Malmezînan, axa û began hevkarî li gel walî doktor Reşid di rêkxistina qetlîaman de, di pîjkirina musulmanan ya li dijî mesîhiyan û serkêşiya milîsan de dikir.⁴⁵ Ji hikayetên agahîderan derdikeve ku armanca bingeşê ya beşdariya van sê refên akteran di kiryarên jenosîdê de destdanîna ser mal û milkên ermeniyên bû. Heçî şêx in, hindêk ji wan bi fetwayan kiryarên li dijî ermeniyên meşrû dêran û han dan. Di hindêk ji van fetwayan de, kuştina ermeniyên wek erkekî dihat destnîşankirin, hindêkên din mal û milkên wan bi "helal" didêran, û hindêkên din bang dikir ku zarokên wan bîn musulmankirin û kuştina ermeniyên bi vê we' deyê han dida ku digot: "Yê ku heft ermeniyên bikuje dê biçê beheştê".⁴⁶ Li gel vê, divê neyê ji bîr kirin ku hindêk axa, beg û şêxan ev qetlîam pesend nekirin û hewl dan ermeniyên xelas bikin.⁴⁷

“*Cendirmeyên Bejik*” an jî *mîlîsên “paramîlîter” yên 1915ê*

Xebatên li ser dîroka devkî ronahiyêke nû dixê ser diyardeyan û di asta herêmi de belge û analîzên heyî yê li ser rêxistina qetlîamê temam dikin. Piraniya agahîderên me behsa *cendirmeyên bejik* dikir, û bi vî awayî kurdên ku beşdarî qetlîama ermeniyên ya sala 1915an bûbûn wek komeke paramîlîter dinimandin. Ew neçûbûn sengerê, lê beşdarî rêxistineke taybetî bûbûn, wek ku di berhemên nivîskî de bi navê *Teşkilat-ı Mahsus* tê zanîn. Ev kategoriya nû ku di lêkolînên meydanî de hatibû xuyakirin, li gorî modela Naimark, em wê di asta herî jêr ya tevlihbûna qetlîamê de bi cih dikin.

Di ferhenga kurmancî ya Zana Farqînî de, peyva *bejik* tê wateyên “parêzvanê gund” û “mîlîs”.⁴⁸ Li gorî agahîderan, mîsyona bejikan komkirina ermeniyên, êrîşkirina qefîleyên wan ên li ser rêya sirgunê û qewirandin û kuştina ermeniyên mayî bû. Ji ber ku mêrên 20 ta 45 salî li ser çeperên şerî bûn, piraniya *cendirmeyên bejik* ji 45 salî pêdetir bûn.⁴⁹ Yê ku ji bo rêxistina taybetî hatibûn hilbijartin xwedî profileke “mêrên bihêz”, bi dest û pê û zanîneke baş ya herêmên xwe bûn. Ew bi piranî ji gundiyên hejar yê bêsîr pêk dihatin. Ji her gundekî ji sê heta pênc *bejik* bi tenê di herêmên xwe de çalak bûn. Ahmedê ku sala 1925an li gundekî Farqînê hatiye dinyayê behsa hikayeta bavê xwe ku wê demê *bejik* bûye dîke:

Bavê min *bejik* bû. Bi çeteyekê ve girêdayî bû. Wî gelek ermenî kuştin. Lê belê di dawîya umrê xwe de ji ber tiştên ku li dijî ermeniyên kiribûn pir xemgîn bû. Wî digot ku endamên çeteya wî gelek jin û carinan jî zarok kuştine. Lê, li gorî min Xwedê yê wê neheqiyê qebûl neke. (*Ahmed, parçeyek ji axaftinê, gulên 2014*).

Di çîroka Ahmedî de, peyva “çete” xwedî girîngiyêke taybetî ye. Kévorkian nîşan dide ku di raporeke 20ê kanûna 1915an de, Mazhar begê serokê komîsyona ankêta lêpîrsînê yê li Mamuret ul-Aziz (*Xarpêt, Elezîz*) û li Diyarbekirê, bi awayekî eşkere walî Reşîd tawanbar dîke, ji ber ku wî bi awayekî derqanûnî komên xeyrî-nizamî ku bûne sebebê wêranî û qetlîaman ava kirin. Formasyona ‘mîlîsan’ ku Kévorkian, piştî xwe dispêre gelek şahidan, ku yek ji wan jî şahidiya walî Reşîd bi xwe ye, pêşiyê piştgirîya doktor Reşîdî⁵⁰ nîşan dide. Ev yek nîşan didin ku ev mîlîs, wek rê û rêbazeke serekî ya doktor Reşîd, heman ev çeteyên *cendirmeyên bejik* yê Rêxistina Taybetî ne.

Li gorî Bozarşan, ji mehkemekirinên li Stenbolê, piraniya şahidiyên berhevkirî û ji wan belgeyên dadgehî yê ku ji aliyê rayedarên Brîtanayê ve li ser kujerên cengê hatibûn amadekirin xuya dibe ku “ev çete” bi awayekî resmî ji aliyê

dewletê ve hatine hilbijartin û bi awayekî dîrekt di bin destûra wê de xebitîne. Mîlîsên ku li bajêr an jî li gundan amadekirî bûn, weku li Diyarbekirê bûye, rasterast bi waliyî ve girêdayî bûn û tevî mîlîsên eşîran akterê duyem yê nedewletî yê qetlîamê pêk tînin.⁵¹

Bîreke berdewamiyê

Ew "bîra dijber" a bi ma'neya Foucault ku me li jor behs kiribû, bi taybetî di hevokekê de ya ku dibêje "*Em şîv in hûn paşîv in*" û ku hema hemû agahîderên min ên li meydana di hevpeyvînan de derbirriye xuya dibe. Diyar e wan ev hevok gelek caran ji ermeniyên bihîstîye gava ermeniyên xwestîye kurdên ku hevkarîya qetlîamê dikir hişyar bikin û bibêjin ku dewleta tirk dikare heman felaketê bîne serê wan jî. Bîra dijber ya derheqê jenosîda ermeniyên de gelek caran di pesendkirina vê hevok û derbirînê de şiklê xwe girtiye. Bi tkrara vê derbirînê kurd berdewamiyekê di navbera halên qurbanîbûna ermeniyên û tecrubeya xwe di destê zext û şîdeta dewletê de durist dîkin. Vê diyarkirin û lêxwedanbûnê pêşiyê agirê bîreke dijber pê xist û paşê xweş kir, ku çend nesl e ev bîr heta îro jî tê veguhastin. Li pey vê bîra dijber, hinek agahîderan têkilî û berdewamiyek navbera Cendirmeyên Bejik û cerdevanên salên 90î de çêkir.

John R. Gillis dibêje ku dema elîtan bi awayekî lidûhev (*linéaire*) diherike, lê dema gelê asayî di nav bîranînên ku rojeva ji rêzê dadigirin "dîreqîse" û "hildavêje" û "*dilşad e ku di nav dema niha de dijî ya ku [tê de] him raborî û him jî dahatû heye.*" Pêdiviya mirovên ji rêzê pê nîne ku xwe bispêrin "*arşîvan, abîdeyan û deverên bîrê yên din ên wisa sabitkirî?*". Eleqeya wan ya bi raboriyê re bêtir di ser bîreke zindî re ye.⁵² Ev fenomena dema gelî ya ku "dîreqîse" û "hildavêje" di hikayetên agahîderên min de jî berçav bû. Wan têkiliyê berdewamiya dîrokî di navbera *bejik* û *cerdevanên* îro de datanî. Ji ber ku hinek cerdevanan di salên 1990î de xwe da aliyê dewletê, ev yek ji hêla agahîderan ve weke berdewamiya bejikan dihat hesabandin.

Farûqê ji Pasûrê, ku li jorê qisetê wî hatibû veguhastin, wiha esehiyê lê dike:

Reftara *bejikan* [ya wê demê] û ya *cerdevanên* ku îro me dikujin heman reftar e. Wê demê, dewletê sîleh dan wan û ji wan re got "hemûyan bikujin". Û axirî wan ew [fileh] kuştin. Ma sîleh nedane *cerdevanan*? Û ma ew jî me nakujin? Ma cerdevan ji bo qirkirina kurdan naxebitin? Herwiha, wê demê [dewletê] sîleh dabûn wan. Dewletê çend qurîş dabûnê. Wê dewrê, pere tune bû, xela bû, ew jî çûn û fileh kuştin, hemû çîrok jî ev e. (*Farûq, parçeyek ji axaftinê, gulên 2014*).

Bîra mekanaan yan jî mekanên bîrê: Topografiya tevkujiyên li Diyarbekirê

Karîgeriya rojane ya di navbera bîrê û mekanên wê de, bi saya kiryar û texeyulên bîrewer (*mnémonique*) yên têvel û heterojen an jî yên li dijî hegemonyê, hewlên desthilatdaran yên ji bo homojênîsazyona dem û cihî (*espace*) bêkêr dike. Tevî zexta deshilatdariyê ya ji bo dasepandina nizameke bêdengiyê, bi her çi rêbazêke şîdetbar jî be, mekan bê rawestan raborîyê bi bîr dixin, bîrên çandî, bi rik û bi awayekî afirîner, û bi rengê pêgirî û sêdaqeta xwe ya bo mekanaan dozê lê dikin.⁵³ Li gorî Pierre Nora, “*bîr xwe di ya şênber de, di mekanî de, di tevgerê de, di îmajê de û di objeyê de bi ripin dike.*”⁵⁴ Anku hesta berdewamiyê di nav mekanî de rehên xwe berdide.

Li gorî Shushan Kerovpyan, ya ku xwe dispêre xebatên Navaro-Yashin,⁵⁵ miletê ku ji axa xwe hatiye vederkirin ne bi awayekî fîzîkî û laşî, lê belê bi objeyên xwe yên berçav, bi malên xwe, bi zeviyên xwe her dimîne. Li vir têgeha sipêla an jî xeyalet dertê ber me. Ji bo Navaro-Yashin, sipêla tiştêkî berçav (*materiel*) e, ew di nav objeyan de û bi rêya objeyan heye. Sipêla ne temsîla tiştêkî ye; lê ew tişt bi xwe ye. Bi rêya hebûna xwe bi xwe, ev objeyên heyî bandorekê li ser jiyana niştecihên wê deverê dikin. Sipêla xwe hem bi rêya hebûna xwe û hem jî bi rêya nebûna xwe diwesifîne. Ev *hebûna bi rêya nebûnê* li Anatolyayê dixuye.⁵⁶ Hebûna objeyên wan hertim nebûna ermeniyên bi bîr dixê. Her wekî Bille û hevkarên xwe bi cext diyar dikin: “*Nebûn tu caran ne bê encam e; ew ne nebûneke rasteqîn e. Nebûn ne vala ye, ew balê dikişîne û di nava jiyana rastî de munasebeteke bi qasî hebûnê ye.*”⁵⁷ Yanî obje û xanî nebûna ermeniyên temsîl dikin. Bi rêya hebûna xwe, ew nebûna xwediyên xwe bi bîr dixin, û misoger dikin.

Wextê ku ez li meydanê bûm, hema bêje hemû agahîderan bi xwezayî behsa cihên ku ermenî lê hatibûn kuştin dikir. Gelek çîrokên jiyayî li ser wan şûnan bi taybetî li herêmên çiyayî yên wek Pasûr, Licê, Farqîn, Gêl, Çêrmûg û Şankûşê hatine veguhastin. Li gorî min, bikaranîna kurdî di derbarê neqilkirina bîra girêdayî van cihên tevkujiyê de xwedî roleke girîng bû. Tevî tirkîkirina navên cihan ji aliyê dewletê ve ji bo “*dahêrana dem û şûna qewmê din*”⁵⁸ û ji nû ve rêkxistina civakê, bi taybetî ji aliyê mekanî ve, ji bo “*jêbirina bîra eqaliyetan*”⁵⁹, kurd di bikaranîna navên “kevn” yên van cihan de berdewam bûne. Ji bilî vê, lawaziya destkariya demografîk a dewletê li Diyarbekirê (nisbet bi herêmên din yên kurdan ku tûşî koçberiyên cemawerî bûbûn) heta salên 1990î ji bo parastina vê bîra girêdayî cihên tevkujiyê pêkereke din ya girîng e. Bi taybetî du cure mekan di nav şahidiyên agahîderan de bi nav bûn: cihên tevkujiya kolektîv ya ermeniyên û wêraniya malên wan û mekanên wek dêr, rez, baxçe, zevî, kanî, aş û hwd.

Em dizanin ku di Shoahê (*Holokostê*) de cihên kuştinê zêdetir menzelên gazê,⁶⁰ di jenosîda tutsiyên Rwandayê de jî ev cih çalên kûr, falezên bilind û qeraxên çeman bûn.⁶¹ Wekî Rwandayê, yekem taybetiya mekanên bîra jenosîda ermeniyên jî karektera wan a topografyayê ye. Wek nimûne ev mekan piranî şikeft, newal, çal, kortik, şeqar, kun, hezaz û zang in. Di nav van cihên bîrê de hinek ji wan bi eşkereyî barê şopên kuştinê hildigrin: *Dudeng, Newala Kuştîya, Çala Filehan, Kaniya Qîskan, Derê Xorî, Korta Filehan, Şeqara Darhuseyn, Şikefta Xwînîyan, Kuna Romî, Hezazê Rûtan, Hezazê Armeniyên, Zanga Filehan, Neqeba Barigan, Newala Qetika, Şikefta Mala Kalê, Zindana Qelecuxê, Kevira Gewr, Newala Qetlê*.⁶² Xasiyeta yekem û berçav a van mekanên qetlîamê dûrbûna wan ya ji ber çavan û xalîbûna wan e. Xuya ye ku armanc veşartin û wendakirina cendekan bû. Weku agahîderekî ji Licê gotibû, van cihan "ermeniyên dadiqurtandin ku ji wan tu şopekî nemîne!".

Cihê ku herî zêde behsa wî hate kirin Dudenga gundê *Yeniköyê* bû ku di navbera Çêrmûgê û Şankûşê de ye. Li gorî agahîderan, eskerên Osmanî û mîlîsên Güllî Beg hemû ermeniyên Çêrmûgê û Şankûşê berhev kiribûn û piştê ew avêtibûn şeqara Dudengê. Adnan, ku di sala 1952an de li gundekî nêzî vê şeqarê ji dayik bûye, çîrokên ku bavê wî di derbarê vî cihî de gotibûn ji me re vedibêje:

Bavê min ji min re gote ku heta çend sal piştî kuştina ermeniyên jî wan nikaribûne ava çemê vexwin. Di ava çem de wan por û tiliyên mirovan didîtin. Çem demeke dirêj bêhneke xelîz daye (*Adnan, parçeyek ji axaftinê, çiriya pêşîn 2013*).

Ciyekî din, Kuna Romî, sarinceke kûr û xwezayî li piştê gundê Serdê a di navbera Licê û Hêne de ye. Li gorî agahîderan, di dema nefkîrinê de ermeniyên ku li aliyê Pasûr û Licê hatibûn berhevkirin, li ser Kuna Romî hatibûn kuştin û piştê jî avêtibûn hundirê vê sarincê. Rabîa ya ku li Pasûrê ji dayik bûye, neviya ermeniyekî bermayî ye. Kalê wê Dîkran di dema jenosîdê de 13 salî bûye. Ew bi xwe di dema kuştina qefla wî de, ji aliyê muxtarê Serdê ve hatiye xilaskirin. Piştê hatiye musulmankirin û navê wî kiribû Hesên. Rabîayê gelek caran çîroka kalê xwe ji devê wî bihîstiye. Ew çîroka wî bi kelegirî dibêje:

Tê bîra min kalê min digot: 'Derdora sarincê tije tiliyên jêkirî bû. Dema ku bi şûr li mirovan dixistin, mirovan ji tîrsa destên xwe dibirin ser histûyên xwe û ji derba şûran tiliyên wan jê dibûn'. Li gorî ku kalê min digot, demeke dirêj qîtal û fîzata yê ku li hundurê sarincê de dihate bihîstin. Dema kuştinê, ew jî li benda dora xwe bûye, hêj dor negihîştiye wî muxtarê gundê Serdê bi

destê wî girtiye û bang li qumandar kiriye: ‘Qumandan, ezbenî, hûn dikarin vî zarokî bidine min da ku ji xwe re wî bikim şivan?’. Qumandar gotiye: ‘Hema ji xwe ra bibe’. Bi wî awayî kalê min ji mirinê xilas bûye. (*Rabia, parçeyek ji axaftinê, kanûn 2013*).

Behsa van her du cihên mezin yê kuştinê (*Dudeng û Kuna Romî*) ji aliyê dîroknasan⁶³ û herwiha ji aliyê şahidên wê demê ve jî⁶⁴ hatiye kirin. Gelek balkêş e ku bîra kurdan ya di derbarê van cihan de li gel şahidiya ermeniyên xelasbûyî hevaheng e. Bo nimûne, tesbîtên Raymond Kévorkian yê derheqê pêvajoya kuştina ermeniyên Şankûş û Licê de,⁶⁵ ku wî bi şahidiya xelasbûyîyan veguhastine, gelek dişibin şahidiyên kurdên van her du deveran. Wekî din, Hesên Hîşyar Serdî, rewşenbîrê kurd ku sala 1907an li gundê Serdê hatiye dinê, bi xwe bûye şahidê jenosîdê û di xatiratên xwe de derheqê wan rojan de nivîsiye. Ew jî behsa Kuna Romî dîke û dibêje bê bi çî awayî ermenî hatine qetlîkirin û çawa ew avêtine hundirê sarincê.⁶⁶

Carinan hinek çîrokên piçûk yê mirovan ku di cihan û bûyeran de reh vedane dihêlin ku mirov bibîne ka çawa wan cihan şikl û fonksiyona mekanên bîrê (*lieux de mémoire*) hilgirtiye. Baranê 82 salî ku li gundekî Pasûrê ji dayik bûye, ji me re çîroka çehla fileha vedibêje ku em li wir dibînin ka cendirmeyekî *bejik* bi çî awayî xuya dibe:

Îca apê min *bejik* bûye. Ji gundê Qurrûcê fillekî digre, gêncekî fille. Deriya hewşa fille li wî dîke tîne tê gundê me. Wî dîke hewşa xwe. Danê heft mala jî bi wî dikute. Dawiyê da dibin diçin ewa qelpika gund wêdatir da, anha em jê re dibêjin çehla fileh, heye. Li vê derê tivingê berdidin wî dikujin. De ka viya karê misilmanan e? (*Baran, parçeyek ji hevpeyvînê, kanûn 2013*).

Kategoriya duyem ya mekanên bîrê, wek ku me behs kiribû, berma û xirbeyên malên ermeniyên û cihên wek dêr, rez, baxçe, zevî, kanî, aş û wekî van in. Bo nimûne *Bewanê Dêrê, Baxçê Garabet, Erdê Kêvo, Zeviya Garo, Tûya Mardo, Erdê Keşîşî, Dara Evane* ji wan cihan in. Çîrokeke bobelatî ku li gundekî Pasûrê qewimiye, bi eşkereyî tevlibûna kesên asayî nîşanî me dide. Ji vê jî wêdetir, nîşanî me dide ka mekanekî bîrê bi çî awayî durist dibe. Elîfaya 80 salî ku ji gundekî Pasûrê ye bi hesteke kelegirî çîroka Evan ji me re bi zazakî got:

Êvane, bi destê dewijê ma yo ke nameyo ey Hesên bîyo ameya xelasnayîşe û bi serran axur de nimitî menda. Rojêke Hesên şono hêga, Êvane zî fikirîyena û vana “senîn bo wext derbas bi, do

hinî bi min eleqeder nêbê" û axure ra kona teber. Dewijî Êvane qefelnenê û benê serê Ênê Xanzaranî. Kincanê aye vecenê û aye kişenê. Meytê aye erzenê dere. A şewe varito ke bi qewet vareno. Her kes fikiryeno ke Êvane lêmiştî ver de şîya la çend rojî badê cû aynenê ke cayo ke Êvane uca de bî hezaz virazîyo û Êvane bin de menda. Waxtêk badê cû uca de leyê gozêr bîya hêşîn. A gozêr hema zî uca da û dewijî a dare ra vanê Darê Êvane. Dewijan Êvane kişte la a bi darek bî hêşîn û nameya aye qet nêame vîrrakerdiş. (*Elîf, parçeyek ji hevpeyvînê, çiriya pêşî 2013*).

Encam

Di dawîya vê behsê de, ez dixwazim van derbirînên agahîderan, yên bi rêya hevpeyvînên tarîxa devkî berhevkirî, bi awayekî giştî binirxînim û çend fikrên ku ji wan derdikevin pêşkêş bikim. Serê pêşî, ev şahidiyên ku me pêşkêş kirine tarîxnivîsiya tirk ya li ser înkare avabûyî red dikin û qelî û bêbingehiya wê li me ron dikin. Ew herwiha bi me didin famkirin ka çawa îro kurd bi vê raboriya dilsoj û giran re rû bi rû dibin. "Axîna sedsalî" gotinek e ku kurd di jiyana rojane de dikelimin û ev gotin bi awayekî yekser rola wan ya di qetlîama ermeniyên de derdibire û aşkera dike. Xerabiyên ku ji aliyê serkêş û endamên gelê kurd ve li dijî ermeniyên hatine kirin, bîreke hevbeş ya negatîv, ku bi xwe re hesteke sûcdariyê jî tîne, di nav civaka kurdan de ava kiriye û ew hestê hê jî li Diyarbekirê gelek zindî ye. Em dikarin van çîrokên şahidan wek "rûbirûbûneke simbolîk" ya bi raboriyê re bi nav bikin.⁶⁷ Di heyne hevpeyvînan de em tê gihîştin ku şîroveya çîrokên di derbarê 1915ê de nîşanî me didin ku tevîbûna hinek kurdan a di jenosîdê de şopên qahîm û daîmî di nav bîra raboriyê de hiştine û ev bîr di nav nifşên cuda de heta îro hatiye vuguhastin.

Bi vî rengî, ev "le'neta sedsalî" ya li ser serê kurdan, ya ji ber beşdariya wan a di qetlîama 1915ê de, coreke serhildana wan zanyariyan e ku bo heyameke dirêj hatibûne serkutkirin û bédengkirin. Îro ev zanyarî bi şiklê şîrove û hikayetên wisa têne derbirin ku dawîya trajîk a berpirsyarên qetlîaman ji me re vediguhêzin. Bo nimûne, standina wan mal û milkên ermeniyên ji destê kurdan ku piştî qetlîamê dest danîbûn ser, sebebê qirkirina nifşê dawî yê malbatên wan, an jî sebebê "hemû bela û musîbetên bi ser wan de hatin" wek netîceyên wan neheqî û hovîtiyan yên ku wan li ermeniyên kirine şîrove dikin.

Em dikarin bibêjin ku ev diyardeya rûbirûbûna simbolîk ya bi raboriyê re bûye 'topos'ek di gotinên şahidan de,⁶⁸ her wekî di edebiyata kurdî ya hevçerx de jî tê dîtin. Temayên wek kirîvatî, berdewamiya mexdûriyetê navbera ermen û kurdan de, ermenên musulmankirî û hwd., ku di nav bîra gel de hê jî zindî ne, bi awayekî berbiçav di nav roman û çîrokên kurdî de jî derdikevin pêş me.⁶⁹ Çîrokên "asayî"

yên jiyana wan ya rojane bûne simbolên “axîn” û “le’net” a ku di bingeha wan de qetlîfama ermeniyana heye. Heye ku pêşketinên van salên dawî û bilindbûna girîngiya tarîxa devkî ya li ser jenosîda ermeniyana rê bidin ku ev tabûya qedîm û bingehî ya tarîxnivîsiya Komara Tirkiyeyê bişikê. Divê vê jî diyar bikim ku tevgera kurd di zîndîkirina bîr û raboriya jenosîda ermeniyana di meydana civakî de aktorekî sereke bûye. Bêyî ku bê jibîrkirin ku berpirsyariya esasî di jenosîda ermeniyana de ya Komara Tirkiyeyê ye û bêyî ku bê piştguhkirin ku tevgera kurd dikare wek amrazekî îstifadeya xwe ji vê bîra jenosîdê bike, divê em biçespînin ku pêşketinên girîng di vê meseleyê de çêbûne, û em bi tenê dikarin hêvîdar bin ku ev pêşketin rêyê li ber venasîneke karîger û tekmîl, ne tenê rûbirûbûneke simbolîk, vekin.

Axirî, Paul Ricoeurê filozofê frensî dibêje ku “*bikaranîna biqîmet a birînên bîrê bi xebitîna li ser karê bîrê dest pê dike.*” Bi ya wî, zehmetiya *karê bibîranînê* li ser sînorên du têkoşînan pêk tê. Zehmetî û astenga yekem berxwedana li dijî *jibîrkirinê* ye. *Karê bibîranînê* divê hewldaneke xurt li dijî *jibîrkirinê* bide û bi şêweyên cuda raboriyê ji dawa *jibîrkirinê* rizgar bike. Astenga duyem jî xetereya *dubarekirinê* ye. Lewre sirf *dubarekirin* piştî demekê haletêke patolojîk digire û ev jî rê li ber *karê bibîranînê* digire.⁷⁰ Ne zehmet e mirov rengvedana van her du cureyên astengan jî di meseleya qira ermeniyana de bibîne. Taybetmendiya dewleta tirk û piraniya welatîyên wê yê bi îdeolojiya netew-dewletê barkirî *jibîrkirin* e, û bersiva wan li ser înkare ava ye. Heçî ermenî bi xwe ne, taybetmendiya wan jî *dubarekirin* e. Trawmaya 1915ê tesîreke mezin li ser hemû aliyên jiyana wan ya îro dike, lewra ew jî tim vê yekê *dubare* dikin. Li dijî van her du astengên *jibîrkirin* û *dubarekirinê*, di qada kurdan de derfeteke xurt ji bo *karê bibîranînê* heye. Xebatên meydanî, edebiyata devkî ya kurdî û temsîla bîra qira ermeniyana ya di edebiyata kurdî ya modern de xwedanê potansiyeleke mezin a *karê bibîranînê* ne, ew potansiyel hêdî hêdî berçavtir û bilindtir dibe. Lewma hêz û îmkanên gotina gel ya yekser di vî *karê bibîranînê* de roleke sereke digêre û dikare bibe rê û derfeteke nû ji bo bihartina astengên *jibîrkirin* û *dubarekirinê*.

Paşnot

1 “Le bon usage des blessures de la mémoire commence par l’exercice du travail de mémoire.” Paul Ricoeur, “Le bon usage des blessures de la mémoire”, tê de: *Les Résistances sur le Plateau Vivarais-Lignon (1938–1945): Témoins, témoignages et lieux de mémoires. Les oubliés de l’histoire parlent* (Editions du Roure, 2005), 6.

2 Joost Jongerden û Jelle Verheij, ed., *Social Relations in Ottoman Diyarbekir, 1870–1915*

(Leiden & Boston: Brill Academic Publishers, 2012).

3 Raymond H. Kévorkian, *Le génocide des Arméniens* (Paris: O. Jacob, 2006); Hilmar Kaiser, *The Extermination Of Armenians In The Diyarbekir Region*, (Istanbul: Istanbul Bilgi Üniversitesi Yay, 2014).

4 Mehmet Polatel û Uğur Üngör, *Confiscation and Destruction: The Young Turk Seizure of Ar-*

- menian Property (London: Continuum, 2011); Mehmet Polatel, "Diyarbakır'ın Sosyo-Ekonomik Dönüşümünde Ermeni Mallarının Rolü", tê de: *Diyarbakır Tebliğleri: Diyarbakır ve Çevresi Toplumsal ve Ekonomik Tarihi Konferansı*, bi edîtoriya Bülent Doğan, (İstanbul: Hrant Dink Vakfı Yayınları, 2013), 389–402.
- 5 Vahé Tachjian, *La France en Cilicie et en Haute-Mésopotamie: aux confins de la Turquie, de la Syrie et de l'Irak : (1919–1933)* (Paris: Karthala, 2004).
- 6 Ferda Balancar, ed., *Sessizliğin Sesi II: Diyarbakırlı Ermeniler Konuşuyor*, (İstanbul: Hrant Dink Vakfı Yayınları, 2012).
- 7 Adnan Çelik û Namık Kemal Dinç, *Yüzyıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbakır*, İsmail Beşikci Vakfı Yayınları (İstanbul, 2015).
- 8 Adnan Çelik û Namık Kemal Dinç, *Yüzyıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbakır*, (İstanbul: İsmail Beşikci Vakfı Yayınları, 2015).
- 9 Di her du xebatan de jî, dane li ser bîra qira ermeniyan bi metoda dîroka devkî hatine berhevkerin. Proje ji şêst hevdiînan û xebata min a doktorayê jî ji sed û pênc hevdiînan pêk tê.
- 10 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*, 435.
- 11 Ayhan Aktar û Abdülhamit Kırmızı, "Diyarbakır 1915", tê de: *Diyarbakır Tebliğleri*; Hamit Bozarslan, Raymond Kévorkian, û Vincent Duclert, *Comprendre le génocide des Arméniens, 1915 à nos jours* (Paris: Tallandier, 2015).
- 12 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*, 441.
- 13 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*; Yves Ternon, *Mardin 1915. Anatomie pathologique d'une destruction - Yves Ternon* (Paris, 2011), <http://www.decitre.fr/livres/mardin-1915-9782705337773.html>; Kaiser, *The Extermination Of Armenians*; Aktar û Kırmızı, "Diyarbakır 1915"
- 14 "... Ermenilere karşı en kestirme usulü tatbik etmek fikrindeyim". Neqlirina Aktar û Kırmızı, "Diyarbakır 1915", 302.
- 15 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*, 438.
- 16 Nejdet Bilgi, ed., *Dr. Mehmet Reşit Şahingiray Hayatı ve Hatıraları*, (İzmir: Akademi Yayınevi, 1997), 28.
- 17 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*, 445.
- 18 Michel Foucault, *Il faut défendre la société : Cours au Collège de France* (Paris: Seuil, 1997), 8.
- 19 Ömer Turan û Güven Gürkan Öztan, "Türkiye'de devlet aklı ve 1915", *Toplum ve Bilim*, j. 132 (2015): 82.
- 20 Ahmad Boubeker, "De la 'guerre des races' aux luttes de l'immigration", *Le Portique*, j. 13–14 (2004): para. 4, <http://leportique.revues.org/619>.
- 21 Foucault, *Il faut défendre la société*, 8–9.
- 22 Neql ji Boubeker, "De la 'guerre des races'", para. 6.
- 23 Taner Akçam, *Un acte honteux: Le génocide arménien et la question de la responsabilité turque*, wer. Odile Demange (Paris: Denoël, 2008).
- 24 Erik J. Zürcher, *The Young Turk Legacy and Nation Building: From the Ottoman Empire to Atatürk's Turkey* (London: I.B.Tauris, 2010); Erik J. Zürcher, *Turkey: A Modern History*, çapa sêyan ya raçavkirî (London: I.B.Tauris, 2004); Hamit Bozarslan, *Histoire de la Turquie : De l'Empire à nos jours* (Paris: Editions Tallandier, 2015).
- 25 Barış Ünlü, "'Türklük sözleşmesi' ve Türk solu", *Perspectives*, j. 3 (2013): 23–27; Barış Ünlü, "Tüklük Sözleşmesinin İmzalanışı", *Mülkiye Dergisi*, j. 38 (3) (2014): 47–81.
- 26 Ünlü, "Tüklük Sözleşmesinin İmzalanışı".
- 27 Neql ji Agnès Derail-Imbert, "Le recouvrement du passé. Histoire et mémoire dans The Scarlet Letter", *Transatlantica*, j. 1 (2007): para. 2, <http://transatlantica.revues.org/1561>.
- 28 Fatma Müge Göçek, *Denial of Violence: Ottoman Past, Turkish Present, and Collective Violence against the Armenians, 1789–2009* (New York: OUP, 2014); Turan û Öztan, "Türkiye'de devlet aklı ve 1915".
- 29 Akçam, *Un acte honteux*; Bozarslan, Kévorkian, û Duclert, *Comprendre le génocide*.
- 30 Adnan Çelik û Namık Kemal Dinç, "1915, Kürtler ve Diyarbakır: Toplumsal Hafızanın Kaynakları ve Kuşaklararası Aktarımı Üzerine Bazı Tespitler", *Ayrıntı Dergi*, j. 9 (adar 2015).
- 31 Diyardeya kirîvatîyê di beyanên hemû

agahîderên min de bi regekî nizamî xuya dibû. Em dikarin bêjin ku mîna *toposekê* ye derheq têtikilyên cîraniyê, yê himayet û têtikilyên aborî di navbera Ermeniyên û kurdan de. Kirîvatî şeweyekî tifaqê ye di navbera Kurd û Ermeniyên de ku dihêle cudatiya xwe ya dînî û qewmî derbas bikin da ku bigihine “pêkvejiyana ma-qûl”. Kirîvatî dibe di navbera du malbatan de be, an jî di navbera serok eşîr, axa an begekî kurd û esilzade an zenaetkarekî de be. Ev saziya xeyrî-resmî gelek berî 1915an hebû û dikir ku rêza mûteqabil pêk bê di navbera terefan de di meseleyên dînî, hevîrtina di kar û barên rojane de û danûstandinên aborî di navbera terefan de bi quwettir dibûn. Kirîvatî îşaretê bi têtikilyên aştiyane an jî aşkirî dike û bi coreke nostaljiya bo demên xweşbext û bê muşkîle (û carinan bi durûtî) têne derbirrîn. Her çend kirîvatîya ku malbata agahîderên min bi Ermeniyên ve girê dide gelek bi rehetî tê behskirin, helbet tevahiya bîra jenosîdê di vê diyardeyê de nîne.

32 Walter Benjamin, *Oeuvres I*, Gallimard (Paris: Folio, 2000), 153–154.

33 James E. Young, *Writing and Re-Writing the Holocaust: Narrative and the Consequences of Interpretation*, (Bloomington: Indiana University Press, 1988).

34 Alice Krieg, “‘La dénomination comme engagement’: Débats dans l’espace public sur le nom des camps découverts en Bosnie”, *Langage et société*, j. 93 (2000): 66.

35 Ergin Öpengin jî min re got ku li herêma Mîksê peyva “muhacirî” tê bikaranîn.

36 Çelik û Diñç, *Yüzyıllık Ah!*, 88.

37 Jacques Semelin, “Éléments pour une grammaire du massacre”, *Le Débat*, j. 124 (2003): 163.

38 Ibid.

39 Bozarslan, Kévorkian, û Duclert, *Comprendre le génocide*, 219.

40 Ibid., 137.

41 Norman M. Naimark, “Preface”, tê de: *A Question of Genocide: Armenians and Turks at the End of the Ottoman Empire*, bi edîtorîya F.M. Göçek, R.G. Suny û N.M. Naimark (Oxford: OUP, 2011), xvi.

42 “*Rêxistina Taybetî*” baskekî çekdar yê CÎTê

bû. Her ji avabûna wê ve, Rêxistina Taybetî, ku nêzikî 12000 mirov di nav refên wê de bûn, bi destê navendeke siyasî dihat birêvebirin ku tê de çar ji neh endamên komîteya merkezî ya CÎTê cih digirtin. Kadr û berpîrsên wê jî memûrên nêzikî partiyê û endamên wê jî du deran dihatin hilbijartin: ji tawanbarên mafên muşterek, ku li ser emrê wezaretê dadê hatibûn berdan, û ji eşîretên çerkez û kurd.” (Bozarslan, Kévorkian, û Duclert 2015, 92).

43 Bozarslan, Kévorkian, û Duclert, *Comprendre le génocide*, 91.

44 Çelik û Diñç, *Yüzyıllık Ah!*, 211–254.

45 Ibid., 221–229.

46 Ibid., 154–166.

47 Rohat Alakom, *1915 Komkujiya Ermeniyên*, Avesta (Istanbul, 2015); Burçin Gerçek, “1915’te Diyarbekir Vilayeti’nde emirlere karşı gelenler”, tê de: *Ermeni Soykırımı’nda Vicdan ve Sorumluluk* (Istanbul: Hrant Dink Vakfı, 2015), 55–74; Çelik û Diñç, *Yüzyıllık Ah!*

48 Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stembolê (Stembol, 2007).

49 Kaiser, *The Extermination Of Armenians*, 220–225; Çelik û Diñç, *Yüzyıllık Ah!*, 130.

50 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*, 439.

51 Bozarslan, Kévorkian, û Duclert, *Comprendre le génocide*, 221–222.

52 Neql jî aliyê Hişyar Özsoy, “Şeyh Said’in Kayıp Mezarı: Kürtlerin Egemenlik Mücadelesinde Hafıza-Mekân Diyalektiği”, *Toplum ve Kuram Dergisi*, j. 9 (2014): 195.

53 Ibid., 196.

54 Pierre Nora, *Les lieux de mémoires Tome I La République* (Bibliothèque illustrée des Histoires Gallimard, 1984), xix.

55 Yael Navaro-Yashin, *The Make-Believe Space: Affective Geography in a Postwar Polity* (Durham, NC: Duke University Press, 2012).

56 Neql jî Shushan Kerovpyan, “La pierre porteuse de mémoire : le rapport à l’héritage arménien en Turquie” (Teza masterê, EHESS, 2013), 51.

57 Neql jî Ibid., 52.

58 Kerem Öktem, “Incorporating the Time and Space of the Ethnic ‘other’: Nationalism and

Space in Southeast Turkey in the Nineteenth and Twentieth Centuries", *Nations and Nationalism* j. 10/4 (2004): 559–78.

59 Uğur Ümit Üngör, "Young Turk Social Engineering, Mass Violence and the Nation State in Eastern Turkey, 1913–1950" (Teza doktorayê, Zanîngeha Amsterdam, 2009), 371.

60 Bnr. Shlomo Venezia, *Sonderkommando : Dans l'enfer des chambres à gaz* (Paris: Le Livre de Poche, 2009).

61 Hélène Dumas, *Le génocide au village : Le massacre des Tutsi au Rwanda* (Paris: Seuil, 2014), 51.

62 Çelik û Dinç, *Yüzyıllık Ah!*, 190.

63 Bnr. Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*; Yves Ternon, *Mardin 1915 - Bir Yıkımın Patolojik Anatomisi*, wer. Naringül Tateosyan (İstanbul: Belge Yayınları, 2013).

64 Hesên Hîşyar Serdî, *Dîtin û Bîrhatinên Min (1914–1983)*, Emîral (Beyrût, 1993), 122–123.

65 Kévorkian, *Le génocide des Arméniens*.

66 Serdî, *Dîtin û Bîrhatinên Min (1914–1983)*.

67 Adnan Çelik û Namık Kemal Dinç, "Yüzyıllık Ah: Kürtlerin 1915'e Dair Anlatılarında Sembolik Yüzleşme ve Vicdan Hikâyeleri", tê de: *Ermeni Soykırımı'nda Vicdan ve Sorumluluk: Kurtulanlara Dair Yeni Araştırmalar*, (Hrant Dink Vakfı Yayınları İstanbul: 2015), 75–92.

68 Ibid.

69 Adnan Çelik û Ergin Öpengin, "The Armenian genocide in Kurdish novels: restructuring the Kurdish identity through collective memory", *European Journal of Turkish Studies*, (2016): <http://ejts.revues.org/5291>.

70 Paul Ricoeur, "Le bon usage des blessures de la mémoire", 6.

Bibliyografya

Akçam, Taner. *Un acte honteux: Le génocide arménien et la question de la responsabilité turque*. wer. Odile Demange. Paris: Denoël, 2008.

Aktar, Ayhan, û Abdülhamit Kırmızı. "Diyarbakır 1915". Tê de: *Diyarbakır Tebliğleri-Diyarbakır ve Çevresi Toplumsal ve Ekonomik Tarihi Konferansı*, Hrant Dink Vakfı Yayınları. İstanbul, 2013.

Alakom, Rohat. *1915 Komkujiya ermeniyan*.

Avesta. İstanbul, 2015.

Balancar, Ferda, ed. *Sessizliğin Sesi II: Diyarbakırlı ermeniler Konuşuyor*. Hrant Dink Vakfı Yayınları. İstanbul, 2012.

Benjamin, Walter. *Oeuvres I*. Gallimard. Paris: Folio, 2000.

Bilgi, Nejdî, ed. *Dr. Mehmet Reşit Şahingiray Hayatı ve Hatıraları*. Akademi Yayınevi. İzmir, 1997.

Boubeker, Ahmad. "De la 'guerre des races' aux luttes de l'immigration". *Le Portique*, j. 13–14 (2004). <http://leportique.revues.org/619>.

Bozarslan, Hamit. *Histoire de la Turquie : De l'Empire à nos jours*. Paris: Editions Tallandier, 2015.

Bozarslan, Hamit, Raymond Kévorkian, û Vincent Duclert. *Comprendre le génocide des arméniens, 1915 à nos jours*. Paris: Tallandier, 2015.

Çelik, Adnan, û Namık Kemal Dinç. "1915, Kürtler ve Diyarbakır: Toplumsal Hafızanın Kaynakları ve Kuşaklararası Aktarımı Üzerine Bazı Tespitler". *Ayrıntı Dergi*, j. 9 (2015).

— — —. "Yüzyıllık Ah: Kürtlerin 1915'e Dair Anlatılarında Sembolik Yüzleşme ve Vicdan Hikâyeleri". Tê de: *Ermeni Soykırımı'nda Vicdan ve Sorumluluk: Kurtulanlara Dair Yeni Araştırmalar*, 75–92. Hrant Dink Vakfı Yayınları. İstanbul, 2015.

— — —. *Yüzyıllık Ah! Toplumsal Hafızanın İzinde 1915 Diyarbakır*. İsmail Beşikci Vakfı Yayınları. İstanbul, 2015.

Derail-Imbert, Agnès. "Le recouvrement du passé. Histoire et mémoire dans The Scarlet Letter". *Transatlantica*, j. 1 (2007). <http://transatlantica.revues.org/1561>.

Dumas, Hélène. *Le génocide au village : Le massacre des Tutsi au Rwanda*. Paris: Seuil, 2014.

Farqînî, Zana. *Ferhenga kurdî-Tirkî*. Enstîtuya kurdî ya Stembolê. İstanbul, 2007.

Foucault, Michel. *Il faut défendre la société : Cours au Collège de France*. Paris: Seuil, 1997.

Gerçek, Burçin. "1915'te Diyarbakır Vilayeti'nde emirlere karşı gelenler". In *ermeni Soykırımı'nda Vicdan ve Sorumluluk*, 55–74. İstanbul: Hrant Dink Vakfı, 2015.

Gocek, Fatma Muge. *Denial of Violence: Otto-*

man Past, Turkish Present, and Collective Violence against the Armenians, 1789–2009. New York: OUP, 2014.

Jongerden, Joost û Jelle Verheij, ed. *Social Relations in Ottoman Diyarbekir, 1870–1915*. Leiden & Boston: Brill Academic Publishers, 2012.

Kaiser, Hilmar. *The Extermination Of Armenians In The Diyarbekir Region*. Istanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2014.

Kerovpyan, Shushan. “La pierre porteuse de mémoire : le rapport à l’héritage arménien en Turquie”. (Teza masterê, EHESS, 2013).

Kévorkian, Raymond H. *Le génocide des Arméniens*. Paris: O. Jacob, 2006.

Krieg, Alice. “La dénomination comme engagement: Débats dans l’espace public sur le nom des camps découverts en Bosnie”. *Langage et société*, j. 93 (2000): 33–69.

Naimark, Norman M. “Preface”. Tê de: *A Question of Genocide: Armenians and Turks at the End of the Ottoman Empire*, bi edîtorîya F.M. Göçek, R.G. Suny û N.M. Naimark., xiii - xix. Oxford: OUP USA, 2011.

Navaro-Yashin, Yael. *The Make-Believe Space: Affective Geography in a Postwar Polity*. Durham, NC: Duke University Press, 2012.

Nora, Pierre. *Les lieux de mémoires Tome I La République*. Gallimard, 1984.

Öktem, Kerem. “Incorporating the Time and Space of the Ethnic ‘other’: Nationalism and Space in Southeast Turkey in the Nineteenth and Twentieth Centuries”. *Nations and Nationalism* j. 10/4 (2004): 559–78.

Özsoy, Hışyar. “Şeyh Said’in Kayıp Mezarı: Kürtlerin Egemenlik Mücadelesinde Hafıza-Mekân Diyalektiği”. *Toplum ve Kuram Dergisi*, j. 9 (2014): 307–38.

Polatel, Mehmet. “Diyarbakır’ın Sosyo-Ekonomik Dönüşümünde ermeni Mallarının Rolü”. In *Diyarbakır Tebliğleri: Diyarbakır ve Çevresi Toplumsal ve Ekonomik Tarihi Konferansı*, Hrant Dink Vakfı Yayınları., 389–402. İstanbul: Ed. Bülent Doğan, 2013.

Polatel, Mehmet û Üngör, Uğur Ümit. *Confiscation and Destruction: The Young Turk Seizure of Armenian Property*. London: Continuum, 2011.

Ricoeur, Paul. *La mémoire, l’histoire, l’oubli*. Pa-

ris: Seuil, 2000.

— — —. “Le bon usage des blessures de la mémoire”. Tê de: *Les Résistances sur le Plateau Vivarais-Lignon (1938-1945): Témoins, témoignages et lieux de mémoires. Les oubliés de l’histoire parlent*, 6-8. Editions du Roure, 2005.

Semelin, Jacques. “Éléments pour une grammaire du massacre”. *Le Débat*, j. 124 (2003): 154–70.

Serdî, Hesên Hışyar. *Dîtin û Bîrhatinên Min (1914–1983)*. Emîral. Beyrût, 1993.

Tachjian, Vahé. *La France en Cilicie et en Haute-Mésopotamie: aux confins de la Turquie, de la Syrie et de l’Irak : (1919-1933)*. Paris: Karthala, 2004.

Ternon, Yves. *Mardin 1915. Anatomie pathologique d’une destruction - Yves Ternon*. Paris, 2011. <http://www.decitre.fr/livres/mardin-1915-9782705337773.html>.

— — —. *Mardin 1915 - Bir Yıkımın Patolojik Anatomisi*. wer. Naringül Tateosyan. İstanbul: Belge Yayınları, 2013.

Turan, Ömer û Güven Gürkan Öztan. “Türkiye’de devlet aklı ve 1915”. *Toplum ve Bilim*, j. 132 (2015): 78–131.

Üngör, Uğur Ümit. “Young Turk Social Engineering, Mass Violence and the Nation State in Eastern Turkey, 1913-1950”. (Teza doktorayê, Zanîngeha Amsterdam, 2009).

Ünlü, Barış. “Tüklük Sözleşmesinin İmzalanışı”. *Mülkiye Dergisi*, j. 38/3 (2014): 47–81.

— — —. “Tüklük sözleşmesi ve Türk solu”. *Perspectives*, j. 3 (2013): 23-27.

Venezia, Shlomo. *Sonderkommando : Dans l’enfer des chambres à gaz*. Paris: Poche, 2009.

Young, James E. *Writing and Re-Writing the Holocaust: Narrative and the Consequences of Interpretation*. Indiana University Press. Bloomington:, 1988.

Zürcher, Erik J. *The Young Turk Legacy and Nation Building: From the Ottoman Empire to Atatürk’s Turkey*. London: I.B.Tauris, 2010.

— — —. *Turkey: A Modern History*. Çapa sêyan a raçavkirîf. London: I.B.Tauris, 2004.